# Ji Devê Jinan Stranên Dawetê

Berhevkar: HÎLMÎ AKYOL



Institut Kurde de Paris

ŞAREDARIYA BAJARÊ MEZIN A AMEDÊ

INSTITUT KURDE DE PARIS
*Bibliothèque*

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

LIV. KL. 2443
03/10/2017
710 AKY JID

# JI DEVÊ JINAN STRANÊN DAWETÊ

Institut kurde de Paris

Berhevkar: HÎLMÎ AKYOL

INSTITUT KURDE DE PARIS
*Bibliothèque*
Reçu le 03/10/2017

Institut kurde de Paris

**Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê**
**Çand:** 53
**Ji Devê Jinan Stranên Dawetê**

**Berhevkar**
Hîlmî Akyol

**Wêneyê Bergê:** Fewzî Bîlge

**Sêwirandina Bergê: Bahar Demîrtaş**

**Vekolîn:** Bîra Muzîka Kurdî ya Konservatuara Aram Tîgran
(http://www.biramuzikakurdi.diyarbakir.bel.tr)

**Nota:** Evren Koç

**ISBN:** 978-605-9886-01-7

**Çap:** 2015

**Çapxane:**
Gün Matbaacı lı k Reklam Film Bası n Yay ın
Tan. San. Tic. LTD. ŞTİ .
Beş yol Mevkii Akasya Sk. No: 23 Küçükçekmece / İstanbul
Tel: 0212 580 63 81
Sertifika No: 12667

Amadekariya ji bo çapê
NATUREL Reklam Basın

Serokatiya Daîreya Çand û Tûrîzmê ya Şaredariya
Bajarê Mezin a Amedê
Cadeya Elazixê Avahiya Xizmetê ya
Şaredariya Bajarê Mezin, AMED
Tel: 0 412 223 49 42 Fax: 0 412 229 30 52
E-poste: kultur@diyarbakir.bel.tr web: http://diyarbakir.bel.tr
http://turizm.diyarbakir.bel.tr

© Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê
Her cure mafê weşanê aîdî Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê
ye. Bêyî destûra Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê bi tu awayî
beşek jê yan jî bi tevahî nayê weşandin an jî zêdekirin.

Institut kurde de Paris

# NAVEROK


6 **Riqya Pale**

Bindan e ha Bindan e – 02:22

Eynikê – 03:04

Li Bazdanê – 01:52

Hayê – 00:52

Hewî – 03:22

Heyla Kinê – 04:20

Hûrik Hûrik Baranê 00:57

Kaniyên li Gundan - 05:17

Li Seyrana – 04:15

Malê Min – 02:23

Mi Lawîn e - 0242

Naçme Leqatê – 01:21

Selîmo – 03:45

Sindo ye - 02:52

Sînem – 06:37

Xezala Minê – 03:00

Şeng Nazê – 02:33

36 **Emîna Elî**

Berbanekê - 01:37

Hêrîzar - 01:22

Ket Xermiyanê - 03:04

Nade - 02:47

Qaza Golê - 02:50

Tobe - 03:20

Xaniyê Memo - 02:25

Xalo Hecî - 03:34

Xerîbê - 05:12

Zengilê Narîn - 01:50

Zêr Hêlan - 02:56

Ê Wele - 00:58

Şê û Şê - 01:39

60 **Fatma Çaçan**

Ava Sorgula – 01:39

Bêriya Êvarê – 02:48

Dîn Delal – 01:02

Eba ye – 01:38

Feqî – 03:40

Ferat – 02:13

Herne Bêriyê - 01:48

Heyrano – 02:45

Li Kendala – 00:55


Institut kurde de Paris

Li Mêrgêwo – 02:19

Sê Mal – 02:13

Nastînim – 01:09

Wer Hêne – 02:38

Werdek im – 01:31

83 **Hawîşana Reşît**

De Yoyo – 02:30

Ha Nîna De Birê Bûkêwo – 08:05

Lêr lê Gulê – 02:44

Hêlî Heseno – 03:52

Memanî – 03:27

Li Binya Kelêwo – 02:02

Tasek Ava Camiyê – 03:20

Asê – 05:22

Werî lê Emîne - 08:57

Wey Felekê – 04:18

Wez Hene – 05:32

Xalê Xelyazê – 03:00

107 **Gula Fexrî**

Bilûrvan – 00:51

Delîl Yarê – 03:05

Ha bi çend e – 04:06

Hele Hela – 04:40

Nînayî te me – 01:06

Tol Meçine – 01:11

119 **Sêva Elî**

Dara li nav Dara – 00:58

De Derxin – 01:33

Gula Zer – 01:52

Herê Zerdê – 00:51

Li Min Eskero – 02:53

Li Mêrgêwo – 03:30

Wez Gul im – 02:09

Wez Hene – 01:34

130 **Hacîra Meydîn**

Delal e – 02:19

Deng Nakim – 02:49

Ha Lawîn – 00:38

Ha Nana – 01:19

Ker Kanê – 01:22

Xerîbê – 00:33

139 **Salika Feyzî**

Ewrê Ser Me – 02:10

Gewrê Lê – 02:28

Her Bêlim – 03:03

Her Bînim – 00:32

Mendîl – 02:11

Cendirme – 03:28

Institut kurde de Paris

## Riqya Pale
(Rukiye Akyol)
1931 - 2011



Riqya Pale, di sala 1931an de li gundê Kuferciné yê bi ser navçeya Hezroya Amedê ve, ji dayik bûye. Malbata wê ji gundê Xanikê ye. Piştî ku ev gund bi hinceta piştgirî dane Serhildana Şêx Seîd hatiye şewitandin, bavê wê Mihemedê Pale mala xwe pêşî dibe gundê Kufercinê û paşê jî dibe gundê Mûnisê. Ji malbateke kurmanc e. Riqya Pale 13 salan li gundê Mûnisê dimîne. Piştî dizewice, diçe gundê Dêrsilê. Piştî sala 1961ê bi malbatî li Amedê bi cî dibin. Riqya Pale gelek stran û çîrokan û stranên govendê jî gotine. Ji dawetan û civatên pîrekan fêrî stran û çîrokan bûye. Dibistan nexwendiye. 3 kur û 5 keçên wê hene.

# Bindan e ha Bindan e

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-53
Çavkanî: Riqya Pale
Herêm: Amed
Berhevkar: Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 09.01.2015

Notadanêr: Evren Koç




Institut kurde de Paris

Bindan e ha Bindan e
Bindan e ha Bindan e
Bindan gundê mîran e
Bindan gundê mîran e
Mal û milkê şêxan e
Mal û milkê şêxan e
Ûso cehşê keran e
Ûso dehşê keran e
Kuştî layê mîran e
Kuştî layê mîran e
Ji bûna mal û milkan e
Ji bonê mal û milkan e
Qasim bego lawîno
Qasim bego lawîno
Te kiras kino cawîno
Te kiras kino cawîno
Te kuşt Qedriyê zavîno
Te kuşt Qedriyê zavîno

Xwendina Kodên Stranan
Mînak: No: G – AJD – 001 (G:Gelerî, A: Herêma Amedê, J: JinDistirê, D: Teşeya wê Strana Dawetê, 001 Hejmara Stranê ya Arşîvê)

# Eynikê

Bira Muzika Kurdî
No: G - AJD-54
Çavkanî: Riqya Pale
Herêm: Amed
Berhevkar: Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 09.01.2015

Notadanêr: Evren Koç




Eynikê tu eynî eynikê eynikê
Neynikê tu neynî neynikê neynikê

Eynika dikêye eynikê eynikê
Eynika dikêye eynikê neynikê
Eynika Hîlmî ye eynikê eynikê
Eynika keko ye eynikê neynikê
Ge li ber piştê ye eynikê eynikê
Ge li ser çokê ye eynikê neynikê
Bala min lê ye eynikê eynikê
Eşqa min jê ye eynikê neynikê

Eynikê tu eynî eynikê eynikê
Neynikê tu neynî eynikê neynikê

Eynika dikêye eynikê eynikê
Eynika dikêye eynikê neynikê
Eynika Tarîq e eynikê eynikê
Eynika keko ye eynikê neynikê
Ge li ber piştê ye eynikê eynikê
Ge li ser çokê ye eynikê neynikê
Bala min lê ye eynikê eynikê
Eşqa min jê ye eynikê neynikê
Eynikê tu eynî eynikê eynikê
Neynikê tu neynî eynikê neynikê

Institut kurde de Paris

# Li Bazdanê

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJGG-55
Çavkanî: Riqya Pale
Herêm: Amed
Berhevkar: Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 09.01.2015

Notadanêr: Evren Koç




He li bazdanê bazdanê lê hevala min û kewê
He li bazdanê bazdanê lê hevala min û kewê
He li bazdanê bazdanê lê hevala min û kewê
He li bazdanê bazdanê lê hevala min û kewê

Ew kî rabû ji xewê lê hevala min û kewê
Ew kî rabû ji xewê lê hevala min û kewê
Ew kî rabû ji xewê lê hevala min û kewê
Ew kî rabû ji xewê lê hevala min û kewê

Salîhe rabû ji xewê lê hevala min û kewê
Keçik rabû ji xewê lê hevala min û kewê
Salîhe rabû ji xewê lê hevala min û kewê
Keçik rabû ji xewê lê hevala min û kewê


Dest dada elba dewê lê hevala min û kewê
Dest dada elba dewê lê hevala min û kewê
Dest dada elba dewê lê hevala min û kewê
Dest dada elba dewê lê hevala min û kewê

Institut kurde de Paris

# Hayê

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-56
Çavkanî: Riqya Pale
Herêm: Amed
Berhevkar: Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 09.01.2015

Notadanêr: Evren Koç




Hay hayê hayê lê hay hayê hayê
Hay hayê hayê lê hay hayê hayê

Şûşanê korê lê Xato nemayê
Şûşanê korê lê Xato nemayê
Mi dermanek çêkir lê ji mûm û şimayê
Mi dermanek çêkir lê ji mûm û şimayê
Birînay kûre lê derman lê nayê
Birînay kûre lê derman lê nayê


Hay hayê hayê lê hay hayê hayê
Hay hayê hayê lê hay hayê hayê
Şûşanê korê lê Xato nemayê
Şûşanê korê lê Xato nemayê
Mi dermanek çêkir lê ji mûm û hêkêwo
Mi dermanek çêkir lê ji mûm û hêkêwo
Birînay kûre lê derman lê têwo
Birînay kûre lê derman lê têwo

Institut kurde de Paris

# Hewî

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-57
Çavkanî: Riqya Pale
Herêm: Amed
Berhevkar: Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 09.01.2015

Notadanêr: Evren Koç




Institut kurde de Paris

Hewî ha hewî hewî ha hewî
Qeda li te bî bela li ser bî
Ketna te hebî rabûn qe tune bî

Ez û hewya xwi tev çûn qirşika
Ez û edya xwi tev çûn qirşika
Me yê be hev ra xeber didane fena xuşkika
Me yê be hev ra xeber didane fena xuşkika
Derdê hewiyê, derdê ediyê way daye gurçika
Derdê hewiyê, derdê ediyê way daye gurçika

Hewî ha hewî hewî ha hewî
Qeda li tebî bela li ser bî
Ketin hebî rabûn qe tune bî

Ez û hewya xwi tev çûn nokano
Ez û edya xwi tev çûn nokano
Meyê be hev ra xeber didane fena xwuşkano
Meyê be hev ra xeber didane fena xwuşkano
Derdê hewiyê derdê eduyê wayê daye çokano
Derdê hewiyê derdê eduyê wayê daye çokano

Hewiya biçûk çêlek didotin
Hewiya mezin derdê xwi digotin
Hewiya biçûk çêlek didotin
Hewiya mezin derdê xwi digotin

Hewî ha hewî hewî ha hewî
Qeda li tebî bela li ser bî
Ketin hebî rabûn qe tune bî

Hewiya mezin ben û benkêro
Hewiya biçûk berdilka mêro
Hewiya mezin ben û benkêro
Hewiya biçûk berdilka mêro

Institut kurde de Paris

# Heyla Kinê

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-58
Çavkanî: Riqya Pale
Herêm: Amed
Berhevkar: Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 09.01.2015

Notadanêr: Evren Koç




Institut kurde de Paris

Heyla kinê lê lê mala minê way way
Heyla kinê lê lê mala minê way way

Heyla kinê lê lê ji min kintir way way
Heyla kinê lê lê ji min kintir way way
Wez geriyam lê lê ji te pirtir way way
Wez geriyam lê lê ji te pirtir way way
Mi kes nedî lê lê ji te rintir way way
Mi kes nedî lê lê ji te rintir way way

Heyla kinê lê lê mala minê way way
Heyla kinê lê lê mala minê way way

Heyla kinê lê lê ewqasayê way way
Heyla kinê lê lê ewqasayê way way
Min sê cara lê lê lê ramîsayê way way
Min sê cara lê lê lê ramîsayê way way
Cara çara lê lê lê mal avayê way way
Cara çara lê lêlê mal avayê way way

Heyla kinê lê lê mala minê way way
Heyla kinê lê lê mala minê way way


Mi kina xwi dî lê lê lê li nav zebeşa way way
Mi kina xwi dî lê lê lê li nav zebeşa way way
Mi çav kirê lê lê lê çeplê xwi weşand way way
Mi çav kirê lê lê lê çeplê xwi weşand way way
Heyla kinê lê lê mala minê way way
Heyla kinê lê lê mala minê way way
Mi kina xwi dî lê lê lê li nav kundira way way
Mi kina xwi dî lê lê lê li nav kundira way way
Mi çav kirê lê lê lê wê xwi findira way way
Mi çav kirê lê lê lê wê xwi findira way way

Institut Kurde de Paris

# Hûrik Hûrik Baranê

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-59
Çavkanî: Riqya Pale
Herêm: Amed
Berhevkar: Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 10.01.2015

Notadanêr: Evren Koç




Hûrik hûrik baranê, nuxtik nuxtik baranê
Hûrik hûrik baranê, nuxtik nuxtik baranê

Ew kî li devkê eywanê hûrik hûrik baranê, nuxtik nuxtik baranê
Ew kî li devkê eywanê hûrik hûrik baranê, nuxtik nuxtik baranê
Bûkê li devkê eywanê hûrik hûrik baranê, nuxtik nuxtik baranê
Bûkê li devkê eywanê hûrik hûrik baranê, nuxtik nuxtik baranê
Ew kî bala xwi didanê hûrik hûrik baranê, nuxtik nuxtik baranê
Ew kî bala xwi didanê hûrik hûrik baranê, nuxtik nuxtik baranê
Şêxmûs bala xwi didanê hûrik hûrik baranê, nuxtik nuxtik baranê
Zava bala xwi didanê hûrik hûrik baranê, nuxtik nuxtik baranê

Ew kî li devkê heywanê hûrik hûrik baranê, nuxtik nuxtik baranê
Ew kî li devkê eywanê hûrik hûrik baranê, nuxtik nuxtik baranê
Zava li devkê heywanê hûrik hûrik baranê, nuxtik nuxtik baranê
Zava li devkê eywanê hûrik hûrik baranê, nuxtik nuxtik baranê
Ew kî bala xwi didanê hûrik hûrik baranê, nuxtik nuxtik baranê
Ew kî bala xwi didanê hûrik hûrik baranê, nuxtik nuxtik baranê
Bûkê bala xwi didanê hûrik hûrik baranê, nuxtik nuxtik baranê
Bûkê bala xwi didanê hûrik hûrik baranê, nuxtik nuxtik baranê

Institut kurde de Paris

# Kaniyên li Gundan

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-60
Çavkanî: Riqya Pale
Herêm: Amed
Berhevkar: Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 11.01.2015

Notadanêr: Evren Koç




Hê bi leylo leylo leylo kanê leylokê d'mîran
Hê bi leylo leylo leylo kanê xweşkokê d'mîran

Kanya li gunda hizhizî kanê leylokê d'mîran
Kanya li gunda hizhizî kanê xweşkokê d'mîran
Kêranê nav derizî kanê leylokê d'mîran
Kêranê nav derizî kanê xweşkokê d'mîran
Mi leylo ji bavê dizî kanê leylokê d'mîran
Mi leylo ji bavê dizî kanê xweşkokê d'mîran

Hê bi leylo leylo leylo kanê leylokê d'mîran
Hê bi leylo leylo leylo kanê xweşkokê d'mîran

Kanyê li gunda herîne kanê leylokê d'mîran
Kanyê li gunda herîne kanê xweşkokê d'mîran
Kêranê nav derîne kanê leylokê d'mîran
Kêranê nav derîne kanê leylokê d'mîran
Herin leylo werînin kanê leylokê d'mîran
Herin qolê werînin kanê xweşkokê d'mîran

Institut kurde de Paris

Hê bi leylo leylo leylo kanê leylokê d'mîran
Hê bi leylo leylo leylo kanê xweşkokê d'mîran
Kanya li gunda şerbet e kanê leylokê d'mîran
Kanya li gunda şerbet e kanê xweşkokê d'mîran
Kêranê nav duqet e kanê leylokê d'mîran
Kêranê nav duqet e kanê xweşkokê d'mîran
Mi leylo ji bavê d'xweste kanê leylokê d'mîran
Leylo ji bavê d'xweste kanê xweşkokê d'mîran

Institut kurde de Paris

# Li Seyrana

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-61
Çavkanî: Riqya Pale
Herêm: Amed
Berhevkar: Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 11.01.2015

Notadanêr: Evren Koç




Li seyrana li seyrana narka mala bavê min
Li seyrana li seyrana te şikand qam û cindyê min

Diyarbekrê me bi giya ye narka mala bavê min
Diyarbekrê me bi giya ye te şikand qam û cindyê min

Textê şêxê min têdaye narka mala bavê min
Textê şêxê min têdaye te şikand qam û cindyê min

Şêxê min di nav da razaye narka mala bavê min
Şêxê min di nav da razaye te şikand qam û cindyê min

Deng lê nekin ew zavaye narka mala bavê min
Deng lê nekin ew zavaye te şikand qam û cindyê min

Ew zavakê van apaye narka mala bavê min
Ew zavakê van apaye te şikand qam û cindyê min

Ew xelatê ser destaye narka mala bavê min
Ew xelatê ser destaye te şikand qam û cindyê min


Derdê mim xelqê çiyan e narka mala bavê min
Derdê min xelqê çiyan e te şikand qam û cindiyê min

Institut kurde de Paris

# Malê Min

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-62
Çavkanî: Riqya Pale
Herêm: Amed
Berhevkar: Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 11.01.2015

Notadanêr: Evren Koç




Institut kurde de Paris

Malê min malê min tew malê min malê min
Malê min malê min tew emrê min canê min

Bexçe bi hermiye tew malê min malê min
Bexçe bi hirmiye tew emrê min canê min
Jin heye cindiye tew malê min malê min
Jin heye cindiye tew emrê min canê min
Mêr jê re goriye tew malê min malê min
Mêr jê re goriye tew emrê min canê min

Malê min malê min tew malê min malê min
Malê min malê min tew emrê min canê min

Bexçe bi hinar e tew malê min malê min
Bexçe bi hinar e tew emrê min canê min
Jin heye bê ar e tew malê min malê min
Jin heye bê ar e tew emrê min canê min
Mêr jê re neyar e tew malê min malê min
Mêr jê re neyar e tew emrê min canê min

Malê min malê min tew malê min malê min
Malê min malê min tew emrê min canê min
Bexçe bi hebreş e tew malê min malê min
Bexçe bi hebreş e tew emrê min canê min
Jin heye keleş e tew emrê min canê min
Jin heye keleş e tew malê min malê min
Jin heye keleş e tew emrê min canê min
Mêr jê re nexweş e tew malê min malê min
Mêr jê re nexweş e tew emrê min canê min

Institut kurde de Paris

# Mi Lawîn e

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-63
Çavkanî: Riqya Pale
Herêm: Amed
Berhevkar: Hîlmî Akyol
Dîroka Rererastkirinê: 11.01.2015

Notadanêr: Evren Koç




Mi lawîn e mi lawîn e heyrano mi lawîn e
Mi lawîn e mi lawîn e qurbano mi lawîn e
Mi lawîn e mi lawîn e heyrano mi lawîn e
Mi lawîn e mi lawîn e qurbano mi lawîn e

Ew kî xanî digerîne heyrano mi lawîn e
Ew kî xanî digerîne qurbano mi lawîn e
Ew kî xanî digerîne heyrano mi lawîn e
Ew kî xanî digerîne qurbano mi lawîn e

Cengiz xanî digerîne heyrano mi lawîn e
Zava xanî digerîne qurbano mi lawîn e
Cengiz xanî digerîne heyrano mi lawîn e
Zava xanî digerîne qurbano mi lawîn e

Werîs tilya wî difrîne heyrano mi lawîn e
Werîs tilya wî difrîne qurbano mi lawîn e
Werîs tilya wî difrîne heyrano mi lawîn e
Werîs tilya wî difrîne qurbano mi lawîn e

Institut kurde de Paris

Gewrê korê derman bîne heyrano mi lawîn e
Xwişkê korê derman bîne qurbano mi lawîn e
Gewrê korê derman bîne heyrano mi lawîn e
Xwişkê korê derman bîne qurbano mi lawîn e

Dermanê wî şeba şîn e heyrano mi lawîn e
Dermanê wî şeba şîn e qurbano mi lawîn e
Dermanê wî şeba şîn e heyrano mi lawîn e
Dermanê wî şeba şîn e qurbano mi lawîn e

Mi lawîn e mi lawîn e heyrano mi lawîn e
Mi lawîn e mi lawîn e qurbano mi lawîn e
Mi lawîn e mi lawîn e heyrano mi lawîn e
Mi lawîn e mi lawîn e qurbano mi lawîn e

Institut kurde de Paris

# Naçme Leqatê

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-64
Çavkanî: Riqya Pale
Herêm: Amed
Berhevkar: Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 12.01.2015

Notadanêr: Evren Koç




Institut kurde de Paris

Naçme leqatê ho yeman ho yeman
Ketme înatê ho yemana xwedê

Leqat bi biye ho yeman ho yeman
Wêran bi biye ho yemana xwedê
Di me derketin ho yeman ho yeman
Sê siwar hêdiye ho yemana xwedê
Li me derketin ho yeman ho yeman
Sê siwar hêdiye ho yemana xwedê
Ji me dixwazin ho yeman ho yeman
Qîza miftiye ho yemana xwedê
Ji me dixwazin ho yeman ho yeman
Keça miftiye ho yemana xwedê

Naçme leqatê ho yeman ho yeman
Ketme înatê ho yemana xwedê

Leqat bi genim e ho yeman ho yeman
Wêran bi genim e ho yemana xwedê
Di me derketin ho yeman ho yeman
Sê siwar bi rim e ho yemana xwedê
Li me derketin ho yeman ho yeman
Sê siwar bi rim e ho yemana xwedê
Ji me dixwezin ho yeman ho yeman
Qîza hakim e ho yemana xwedê
Ji me dixwazin ho yeman ho yeman
Keça hakim e ho yemana xwedê
Naçme leqatê ho yeman ho yeman
Ketme înatê ho yemana xwedê

Leqat bi gez e ho yeman ho yeman
Wêran bi gez e ho yemana xwedê
Di me derketin ho yeman ho yeman
Sê siwar bi lez e ho yemana xwedê
Li me derketin ho yeman ho yeman
Sê siwar bi lez e ho yemana xwedê
Ji me dixwazin ho yeman ho yeman
Qîza çerkez e ho yemana xwedê
Ji me dixwazin ho yeman ho yeman
Keça çerkez e ho yemana xwedê

Institut kurde de Paris

# Selîmo

Bîra Muzika Kurdî
No: G - AJD-65
Çavkanî: Riqya Pale
Herêm: Amed
Berhevkar: Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 11.01.2015

Notadanêr: Evren Koç




Ha li kendala l'kendala Selîmo lawo li kendala
Ha li kendala l'kendala Selîmo lawo li kendala
Tejî berda xizala Selîmo lawo li kendala
Tejî berda xizala Selîmo lawo li kendala
Dehwet li mehlê Nemana Selîmo lawo li kendala
Dewet li mehlê Nemana Selîmo lawo li kendala

Ha ser wêlî ser wêlî Selîmo lawo ser wêlî
Ha ser wêlî ser wêlî Selîmo lawo ser wêlî
Par qîz îsal bedêlî par qîz îsal bedêlî
Par qîz îsal bedêlî par qîz îsal bedêlî
Bûm bûka ser bi xêlî bûm bûka ser bi xêlî
Bûm bûka ser bi xêlî bûm bûka ser bi xêlî

Ha li ezmana ezmana Selîmo law li ezmana
Ha li ezmana ezmana Selîmo law li ezmana
Hanîn berxê d'berana hanîn berxê d'berana
Hanîn berxê d'berana hanîn berxê d'berana
Taştiya law mêvana taştiya kur mêvana
Taştiya law mêvana taştiya kur mêvana

Institut kurde de Paris

Ha li titûnê titûnê Selîmo lawo li titûnê
Ha li titûnê titûnê Selîmo lawo li titûnê
Adir da ser qelûnê adir da ser qelûnê j
Agir da ser qelûnê agir da ser qelûnê j
Ji te ra bînim xatûnê ji ta bînim xatûnê
Ji tera bînim xatûnê ji ta bînim xatûnê

Ha li bêdera bêdera Selîmo law li bêdera
Ha li bêdera bêdera Selîmo law li bêdera
Dileyize bi xincera dileyize bi xincera
Dileyize bi xincera dileyize bi xincera
Bûm mêvanê dev zera bûm mêvanê dev zera
Bûm mêvanê dev zera bûm mêvanê dev zera

Institut kurde de Paris

# Sindo ye

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-66
Çavkanî: Riqya Pale
Herêm: Amed
Berhevkar: Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 12.01.2015

Notadanêr: Evren Koç




Sindo ye sindo ye Sindikê lê
Sindo ye sindo ye keçikê lê
Sindo ye sindo ye Sindikê lê
Sindo ye sindo ye keçikê lê

Sindo bi giya ye Sindikê lê
Sindo bi giya ye keçikê lê
Sindo bi giya ye Sindikê lê
Sindo bi giya ye keçikê lê

Siwara xar berdaye Sindikê lê
Siwara xar berdaye keçikê lê
Siwara xar berdaye Sindikê lê
Siwara xar berdaye keçikê lê

Jina rind bela ye Sindikê lê
Jina rind bela ye keçikê lê
Jina rind bela ye Sindikê lê
Jina rind bela ye keçikê lê

Institut kurde de Paris

Sindo ye sindo ye Sindikê lê
Sindo ye sindo ye keçikê lê
Sindo ye sindo ye Sindikê lê
Sindo ye sindo ye keçikê lê

Sindo bi gidîş e Sindikê lê
Sindo bi gidîş e keçikê lê
Sindo bi gidîş e Sindikê lê
Sindo bi gidîş e keçikê lê

Siwara hîşe hîşe Sindikê lê
Siwara hîşe hîşe keçikê lê
Siwara hîşe hîşe Sindikê lê
Siwara hîşe hîşe keçikê lê
Jina rind bexşîş e Sindikê lê
Jina rind bexşîş e keçikê lê
Jina rind bexşîş e Sindikê lê
Jina rind bexşîş e keçikê lê

Sindo ye sindo ye Sindikê lê
Sindo ye sindo ye keçikê lê
Sindo ye sindo ye Sindikê lê
Sindo ye sindo ye keçikê lê

Sindo bi genim e Sindikê lê
Sindo bi genim e keçikê lê
Sindo bi genim e Sindikê lê
Sindo bi genim e keçikê lê

Siwara himehim e Sindikê lê
Siwara himehim e keçikê lê
Siwara himehim e Sindikê lê
Siwara himehim e keçikê lê

Jina rind hakim e Sindikê lê
Jina rind hakim e keçikê lê
Jina rind hakim e Sindikê lê
Jina rind hakim e keçikê lê

Institut kurde de Paris

# Sînem

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-67
Çavkanî: Riqya Pale
Herêm: Amed
Berhevkar: Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 12.01.2015

Notadanêr: Evren Koç




Hoy Sînem Sînem Sînem de tu were were were
Hoy Sînem Sînem Sînem de tu were were were
Hoy Sînem Sînem Sînem de tu were were were
Hoy Sînem Sînem Sînem de tu were were were

Sînem seknî li ser xanî mendolekê dêjîne
Keser seknî li ser xanî mendolekê dêjîne
Sînem seknî li ser xanî mendolekê dêjîne
Keser seknî li ser xanî mendolekê dêjîne
Zer memik bextê te me feqyan ji hucrê derîne
Zer memik bextê te me feqyan ji hucrê derîne
Zer memik bextê te me feqyan ji hucrê derîne
Zer memik bextê te me feqyan ji hucrê derîne
Bakê seherê lêda xizêm ji poza heltîne
Bakê seherê lêda xizêm ji poza heltîne
Bakê seherê lêda xizêm ji poza heltîne
Bakê seherê lêda xizêm ji poza heltîne

Institut kurde de Paris

Hoy Sînem Sînem Sînem de tu were were were
Hoy Sînem Sînem Sînem de tu were were were
Hoy Sînem Sînem Sînem de tu were were were
Hoy Sînem Sînem Sînem de tu were were were

Sînem seknî li ser xanî mendolekê xwi li ba kir
Keser seknî li ser xanî mendolekê xwi li ba kir
Sînem seknî li ser xanî mendolekê xwi li ba kir
Keser seknî li ser xanî mendolekê xwi li ba kir
Bakê seherê lêda xizêm ji poza du ta kir
Bakê seherê lêda xizêm ji poza du ta kir
Bakê seherê lêda xizêm ji poza du ta kir
Bakê seherê lêda xizêm ji poza du ta kir
Zer memik bextê te me feqyan hucre xerakir
Zer memik bextê te me feqyan hucre xerakir
Zer memik bextê te me feqyan hucre xerakir
Zer memik bextê te me feqyan hucre xerakir
Hoy Sînem Sînem Sînem de tu were were were
Hoy Sînem Sînem Sînem de tu were were were
Hoy Sînem Sînem Sînem de tu were were were
Hoy Sînem Sînem Sînem de tu were were were

Xeber hatîû ji bavê ra gotî Sînem nexweş e
Keser hatû ji bavê ra gotî Sînem nexweş e
Xeber hatîû ji bavê ra gotî Sînem nexweş e
Keser hatû ji bavê ra gotî Sînem nexweş e
Temîn bikin necara çêke kêlê di reş e
Temîn bikin necara çêke kêlê di reş e
Temîn bikin necara çêke kêlê di reş e
Temîn bikin necara çêke kêlêdi reş e

Temîn kin mar û mişka xira nekin çavê reş e
Temîn kin mar û mişka xira nekin çavê reş e
Temîn kin mar û mişka xeranekin çavê reş e
Temîn kin mar û mişka xeranekin çavê reş

Institut kurde de Paris

Xeber hatû ji bavê ra gotî Sînem miriye
Keser hatû ji bavê ra gotî Sînem miriye
Xeber hatî ji bavê ra gotin Sînem miriye
Keser hatî ji bavê ra gotin Sînem miriye
Temîn bikin necara çêkin kêlê sipiye
Temîn bikin necara çêkin kêlê sipiye
Temîn bikin necara çêkin kêlê sipiye
Temîn kin mer û mişka xira nekin gula rûye
Temîn kin mer û mişka xira nekin gula rûye
Temîn kin mer û mişka xira nekin gula rûye
Temîn kin mer û mişka xira nekin gula rûye

Institut kurde de Paris

# Xezala Minê

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-68
Çavkanî: Riqya Pale
Herêm: Amed
Berhevkar: Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 13.01.2015

Notadanêr: Evren Koç




Xezala minê delala minê her hêlî hêlî hêlî
Xezala minê delala minê av xwar û berjêr çêrî
Xezala minê delala minê her hêlî hêlî hêlî
Xezala minê delala minê av xwar û berjêr çêrî

Xezala minê delala minê pezê bavê te reşo
Xezala minê delala minê pezê bavê te reşo
Xezala minê delala minê pezê bavê te reşo
Xezala minê delala minê pezê bavê te reşo
Xezala minê delala minê gelî da erş e erşo
Xezala minê delala minê gelî da erş e erşo
Xezala minê delala minê gelî da erş e erşo
Xezala minê delala minê gelî da erş e erşo
Xezala minê delala minê derdêm keçka keleşo
Xezala minê delala minê derdêm keçka keleşo
Xezala minê delala minê derdêm keçka keleşo
Xezala minê delala minê derdêm keçka keleşo

Institut kurde de Paris

Xezala minê delala minê her hêlî hêlî hêlî
Xezala minê delala minê av xwar û berjêr çêrî

Xezala minê delala minê pezê bavê te sor e
Xezala minê delala minê pezê bavê te sor e
Xezala minê delala minê pezê bavê te sor e
Xezala minê delala minê pezê bavê te sor e
Xezala minê delala minê d'gelî da ore or e
Xezala minê delala minê d'gelî da ore or e
Xezala minê delala minê d'gelî da ore or e
Xezala minê delala minê d'gelî da ore or e
Xezala minê delala minê derdê'm keçka çixsor e
Xezala minê delala minê derdê'm keçka çixsor e
Xezala minê delala minê derdê'm keçka çixsor e
Xezala minê delala minê derdê'm keçka çixsor e

Xezala minê delala minê pezê bavê te sipiye
Xezala minê delala minê pezê bavê te sipiye
Xezala minê delala minê pezê bavê te sipiye
Xezala minê delala minê pezê bavê te sipiye
Xezala minê delala minêd gelî da mexel biye
Xezala minê delala minêd gelî da mexel biye
Xezala minê delala minêd gelî da mexel biye
Xezala minê delala minêd gelî da mexel biye
Xezala minê delala minê derdêm keçka miftiye
Xezala minê delala minê derdêm keçka miftiy


Xezala minê delala minê derdêm keçka mifti
Xezala minê delala minê derdêm keçka miftiye

Institut kurde de Paris

# Şeng Nazê

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-69
Çavkanî: Riqya Pale
Herêm: Amed
Berhevkar: Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 12.01.2015

Notadanêr: Evren Koç




Institut kurde de Paris

Şeng nazê nazê nazê nazoka min
Şeng nazê nazê nazê delalya min
Şeng nazê nazê nazê nazoka min
Şeng nazê nazê nazê delalya min

Ew kî ew kî siwar bû nazoka min
Ew kî ew kî siwar bû delalya min
Ew kî ew kî siwar bû nazoka min
Ew kî ew kî siwar bû delalya min

Tarîq şêxmûs siwar bû nazoka min
Tarîq şêxmûs siwar bû nazoka min
Tarîq şêxmûs siwar bû nazoka min
Tarîq şêxmûs siwar bû nazoka min

Li Diyarbekrê peya bû nazoka min
Li Diyarbekrê peya bû delalya min
Li Diyarbekrê peya bû nazoka min
Li Diyarbekrê peya bû delalya min

Qewe xwar û bêsa bû nazoka min
Qewe xwar û bêsa bû nazoka min
Qewe xwar û bêsa bû nazoka min
Qewe xwar û bêsa bû nazoka min
Serê xesyay qurban bû nazoka min
Serê xesyay qurban delalya min
Serê xesyay qurban bû nazoka min
Serê xesyay qurban delalya min

Xwestyay rabû pê şa bû nazoka min
Xwestyayrabû pê şa bû delalya min
Xwestyay rabû pê şa bû nazoka min
Xwestyay rabû pê şa bû delalya min

Institut kurde de Paris

# Emîna Elî

**(Emine Karatepe)**

**1941**



Emîna Elî, di sala 1941an de (ew dibêje ku di nasnameyê de 1946 e lê çewt e) li gundê Bindanê yê bi ser nehiyeya Mermera Fîsê ya Amedê ve, ji dayik bûye. Dibistan nexwendiye. Bi eslê xwe ji gundê Şikeftê Cemaldînayê ye ku gundekî navçeya Hezroyê ye. Ji malbata Hecî Mîrza ne. Li Şêxxelîlka zewiciye û 23 salan li Şêxxelîlka maye. Malbata wê kurmanc e. Ji dawet û civatên pîrekan û li çolê li kerengvanî, leqatvanî û sergînvaniyê fêrî stranan bûye. 27 sal in li gundê Çawîşiyê dijî ku bi ser Bismilê ve ye. 5 kur û 3 keçên wê hene.

Institut kurde de Paris

# Berbanekê

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-02
Çavkanî : Emîna Elî
Herêm : Amed / Navçeya Bismil / Gundê Çawîşiyê
Berhevkar : Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 30.12.2014

Notadanêr: Evren Koç




Institut kurde de Paris

Berbanekê berbanekê
Berbanekê gulçîçekê
Ew kî berbanek girê da
Ew kî gulçîçek girê da

Berbanekê hilde jorê
Gulçîçekê xwebide dorê
Berbanekê hilde jorê
Gulçîçekê xwe bide dorê
Bavê te hakimê zorê
Bavê te hakimê zorê
îslam gawir xwe da dorê
îslam gawir xwe da dorê

Bûrim bûrim berbanekê
Bûrim bûrim gulçîçekê
Ew kî berbanek girê da
Ew kî gulçîçek girê da
Kinê berbanek girê da
Kinê gulçîçek girê da


Berbanekê xwe bide jorê
Gulçîçekê xwe bide dorê
Berbanekê xwe bide jorê
Gulçîçekê xwe bide dorê
Bavê te hakimê zorê
Bavê te hakimê zorê
îslam gawir xwe da dorê
îslam gawir xwe da dorê

Institut kurde de Paris

# Hêrîzar

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-03
Çavkanî : Emîna Elî
Herêm : Amed / Navçeya Bismil / Gundê Çawîşiyê
Berhevkar : Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 30.12.2014

Notadanêr: Evren Koç




Her hêrîzar hêrîzar
Zerdê bi mor û mircan
Geh ez çûm mala Metran
Geh ez hatim mala Metran
Jina Metran çav qitran
Xeber da bi dilkî giran

Geh ez çûm mala Keşe
Geh ez hatim mala Keşe
Jina Keşe çavreş e
Jina Keşe çavreş e
Xeber da bi dilkî xweş e
Xeber da bi dilkî xweş e


Geh ez çûm mala Mele
Geh ez hatim mala Mele
Sebyê Mele ditele
Sebyê Mele ditele
Nola mişkê gobel e
Nola mişkê gobel e
Jina Mele çav bi kil e
Xeber da bi dilkî kul e

Institut kurde de Paris

# Ket Xermiyanê

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-04
Çavkanî : Emîna Elî
Herêm : Amed / Navçeya Bismil / Gundê Çawîşiyê
Berhevkar : Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 30.12.2014

Notadanêr: Evren Koç




Ket xermiyanê ket xermiyanê
Cotê ewkî ket xermiyanê
Ket xermiyanê ket xermiyanê
Cotê ewkî ket xermiyanê

Cotê Hîlmî ket xermiyanê
Cotê kekê'm ket xermiyanê
Cotê Hîlmî ket xermiyanê
Cotê keko ket xermiyanê
Sifr û sênî çû j'talanê
Sifr û sênî çû j'talanê
Sifr û sênî çû j'talanê
Sifr û sênî çû j'talanê

Ew kî mîrê li dîwanê
Ew kî begê li dîwanê
Ew kî mîrê li dîwanê
Ew kî begê li dîwanê

Sidîq mîr e li dîwanê
Kekê'm bege li dîwanê
Sidîq mîr e li dîwanê
Kekê'm begê li dîwanê

Institut kurde de Paris

Ew kî remla li diyaran e
Hîlmî remla li diyaran e
Ew kî remla li diyaran e
Hîlmî remla li diyaran e

Ew kî qutya ber dilan e
Ew kî qutya ber dilan e
Ferzî teyrê li ser destane
Ferzî teyrê li ser destane

Îdris rîşkê guharan e
Îdris rîşkê guharan e
Bedîh rovyê çikalan e
Bedîh rovyê çikalan e

Umer biçûkê van biran e
Umer biçûkê van biran e
Umer biçûkê van biran e
Umer biçûkê van biran e

Sidîq îlmê van melan e
Kekê'm îlmê van melan e
Sidîq îlmê van melan e
Kekê'm îlmê van melan e

Ket xermiyanê ket xermiyanê
Cotê ewkî ket xermiyanê
Ket xermiyanê ket xermiyanê
Cotê ewkî ket xermiyanê
Sifr û sênî çû j'talanê
Sifr û sênî çû j'talanê
Sifr û sênî çû j'talanê
Sifr û sênî çû j'talanê

Institut kurde de Paris

# Nade

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-05
Çavkanî : Emîna Elî
Herêm : Amed / Navçeya Bismil / Gundê Çawîşiyê
Berhevkar : Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 30.12.2014

Notadanêr: Evren Koç




Nade nade nade bav delalê nade
Nade nade nade bav hezarê nade
Li çawîşyê nade,bav delalê nade
Li çawîşyê nade bav hezarê nade

Nade nade nade bav delalê nade
Nade nade nade bav hezarê nade
Li melefyata nade bav delalê nade
Li melefyata nade bav hezarê nade
Xortê Şêxelîlkya dayma b'kêflîne
Xortê Çawîşiya dayma b'kêflîne
Davên ser mezriya bûkek jê hanîne
Davên ser mezriya bûkek jê hanîne

Nade nade nade bav delalê nade
Nade nade nade bav hezarê nade
Li Bismilê nade bav delalê nade
Li Bismilê nade bav hezarê nade
Xortê çawîşiya dayma dikêflîne
Xortê çawîşiya dayma dikêflîne
Davên ser Bismilê bûkek jê hanîne
Davên ser Bismilê bûkek jê hanîne


Institut kurde de Paris

# Qaza Golê

INSTITUT KURDE DE PARIS
Bibliothèque

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-06
Çavkanî: Emîna Elî
Herêm: Amed / Navçeya Bismil / Gundê Çawîşiyê
Berhevkar: Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 30.12.2014

Notadanêr: Evren Koç




Institut kurde de Paris

Delîl im day lê wem çaçan in
Delîl im day lê wem çaçan in
Qayşê piştê me ji qayman in
Qayşê piştê me ji qayman in
Kumê me ji postê berxan in
Kumê me ji postê berxan in
Xwarna me goştê teyran in
Xwarna me goştê teyran in

Qaza golê qazî sor e
Qaza golê qazî sor e
Tembîl da eskerê jor e
Tembîl da eskerê jor e
Teresê tirko tê w bi dor e
Teresê tirko tê w bi dor e

Qaza golê qazî şîn e
Qaza golê qazî şîn e
Tembîl da eskerê çîn e
Tembîl da eskerê çîn e
Teresê tirko tê w bi latîn e
Teresê tirko tê w bi latîn e
Qaza golê qazî reş e
Qaza golê qazî reş e
Tembîl da eskerê reş e
Tembîl da eskerê reş e
Teresê gawir tê w nexweş e
Teresê gawir tê w dimeşe

Institut kurde de Paris

# Tobe

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-07
Çavkanî: Emîna Elî
Herêm: Amed / Navçeya Bismil / Gundê Çawîşiyê
Berhevkar: Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 30.12.2014

Notadanêr: Evren Koç




Her tobe tobe lê tobe Eyşanê way
Wer tobe tobe lê bi nav û nîşanê way

Bejna Eyşanê lê ji Kela Silîva way
Bejna delalê lê ji Kela Silîva way
Westa lêkirî lê şagirt dipîva way
Westa lêkirî lê şagirt dipîva way
Bejna Eyşanê lê sade ji zîva way
Bejna delalê lê sade ji zîva way

Her tobe tobe lê tobe Eyşanê way
Wer tobe tobe lê bi nav û nîşanê way

Bejna Eyşanê lê ji kela bajêr e way
Bejna delalê lê ji kela bajêr e way
Westa lê kirî lê şagirt dijmêre way
Westa lê kirî lê şagirt dijmêre way
Bejna Eyşanê lê sade ji zêr e way
Bejna delalê lê sade ji zêr e way

Institut kurde de Paris

Wer tobe tobe lê tobe Eyşanê way
Her tobe tobe lê bi nav û nîşanê way

Bejna Eyşanê lê ji Kela Etmana way
Bejna delalê lê ji Kela Etmana way
Westa lê kirî lê negî ezmana way
Westa lê kirî lê negî ezmana way
Bejna Eyşanê lê sade ji mircana way
Bejna delalê lê sade ji mircana way
Wer tobe tobe lê tobe Eyşanê way
Her tobe tobe lê bi nav û nîşanê way

Institut kurde de Paris

# Xaniyê Memo

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-08
Çavkanî: Emîna Elî
Herêm: Amed / Navçeya Bismil / Gundê Çawîşiyê
Berhevkar: Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 31.12.2014

Notadanêr: Evren Koç




Institut kurde de Paris

Wî memo memo memo wî memo
Wî memo memo memo wî dayê

Xaniyê memo çar qul e wî memo
Xaniyê keko çar qul e wî dayê
Baranê xulexule wî memo
Baranê xulexule wî dayê
Jina memo bi dil e wî memo
Jina memo bi dil e wî dayê

Xaniyê Memo çardax e wî memo
Xaniyê teres çardax e wî dayê
Fat kulava ranaxe wî memo
Fat kulava ranaxe wî dayê
Pîreka waxewax e wî memo

Xeberdan kir yasax e wî dayê
Nan û dew lê yasax e wî Memo
Nan û dew lê yasax e wî dayê
Xaniyê memo çar tîş e wî memo
Xaniyê keko çar tîş e wî dayê
Baranê rîşerîş e wî memo
Baranê rîşerîş e wî dayê
Çavê reş bû bexşîş e wî memo
Çavê reş bû bexşîş e wî dayê
Wî memo memo memo wî memo
Wî memo memo memo wî dayê

Institut kurde de Paris

# Xalo Hecî *

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-09
Çavkanî: Emîna Elî
Herêm: Amed / Navçeya Bismil / Gundê Çawîşiyê
Berhevkar: Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 01.01.2015

Notadanêr: Evren Koç




Vana vana vana vana vana vana Xalo Hecî
Vana vana vana vana mi çi got û tu behecî

Xalo Hecî tê ji orsa vana vana Xalo Hecî
Teres Hecî tê ji orsa mi çi got û tu behecî
Xumexumê mîtralosa vana vana Xalo Hecî
Xumexumê mîtralosa mi çi got û tu behecî
Kofiya medin ber kolosa vana vana Xalo Hecî
Kofiya medin ber kolosa mi çi got û tu behecî
Çira medin ber fanosa vana vana Xalo Hecî
Çira medin ber fanosa mi çi got û tu behecî

Vana vana vana vana vana vana Xalo Hecî
Vana vana vana vana mi çi got û tu behecî

Institut kurde de Paris

Xalo Hecî tê ji Xiya vana vana Xalo Hecî
Teres hecî tê ji Xiya mi çi got û tu behecî
Tu şerm nakî ji wan riya vana vana Xalo Hecî
Tu şerm nakî ji wan riya mi çi got û tu behecî
Tê hina no bibî eşqiya vana vana Xalo Hecî
Tê hina no bibî eşqiya mi çi got û tu behecî

Xalo Hecî ewa neke vana vana Xalo Hecî
Teres hecî ewa neke mi çi got û tu behecî
Xalo Hecî ewa neke vana vana Xalo Hecî
Teres Hecî ewa neke mi çi got û tu behecî
Go l'gotina şeytan neke vana vana Xalo Hecî
Go l'gotina şeytan neke mi çi got û tu behecî
Beyta Şerîf betal neke vana vana Xalo Hecî
Beyta Şerîf betal neke mi çi got û tu behecî
Vana vana vana vana vana vana Xalo Hecî
Vana vana vana vana mi çi got û tu behecî

Xalo Hecî tê j'bêdera vana vana Xalo Hecî
Teres hecî tê j'bêdera mi çi got û tu behecî
Xirpe xirpê van qondera vana vana Xalo Hecî
Xirme xirmê van qondera mi çi got û tu behecî
Halê hecî halê kera vana vana Xalo Hecî
Halê hecî halê kera mi çi got û tu behecî
Vana vana vana vana vana vana Xalo Hecî
Vana vana vana vana mi çi got û tu behecî
Vana vana vana vana mi çi got û tu behecî
Vana vana vana vana vana vana Xalo Hecî

Institut kurde de Paris

* Stranbêja hêja di vê stranê de dîsgotinên di paşiya rêzan de ji bîr kir û negot. Paşê me pê dan rastkirin.

# Xerîbê

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-10
Çavkanî: Hacîra Meydîn
Herêm: Amed / Navçeya Hezroyê / Gundê Mûnisê
Berhevkar: Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 01.01.2015

Notadanêr: Evren Koç




Hoy hoy li min xerîbê
Hoy hoy li min xerîbê
Bi teqdîr û nisîvê
Ji malî bavanê te kî bê
Dayê mi xerîb mede
Bavo mi xerîb nede
Bi gavanê gundê xwe de
Her înê nanê xwu berev de

Lo birawo di gund da
Lo keko di gund da
Hespa şê way di bin da
Jina xwe dî w terka mi da
Birawo derwêşo
Lo keko derwêşo
Ti Keremke were pêşo
Qelendê xwengê bibêjo

Institut kurde de Paris

Lo birawo Mistefa
Lo keko Mistefa
Bes bixwe gir û gefa
Xwengê teyr l'nava refa
Hoy hoy li min xerîbê
Hoy hoy li min xerîbê
Bi teqdîr û nisîvê
Ji malî bavanê te kî bê

Xerîb nanê germ e
Delîl nanê germ e
Neşkînin lê bi şerm e
Teyr û tirûda girtî ser me
Hoy hoy li min xerîbê
Hoy hoy li min xerîbê
Bi teqdîr û nisîvê
Ji malî bavanê te kî bê
Xerîba Botî me
Delîla Botî me
Kulîlka spî me
Ji mala bavê xwe bêhêvî me
Xerîb here were
Delîl here were
Bi min û te kulav û bere
Şîvê dixwe w taştê dere

Xerîba Henayê
Delîla Henayê
Kevrê li kerbelayê
Xerîb çiye w hêdî nayê
Xerîb mi bi qurban
Delîl mi bi qurban
Ew zendan tijî mircan
Xerîb birne oda rindan
Xerîb mi bi gorî
Delîl mi bi gorî
Ew zendan tijî morî
Xerîb birne oda jorî

Institut kurde de Paris

Porê xwe venakim
Porê xwe venakim
Hîloyê pê wer nakim
Bana xelkê xerîb nakim

Porê min î reş e
Porê min î reş e
Gulya bi sed û şeş e
Şûştina daykê çi xweş e
Porê min î reş e
Porê min î reş e
Gulya bi sed û şeş e
Şûştina daykê çi xweş e
Porî min î sor e
Porî min î sor e
Keziya xelqe dor e
Şûştina xelkê çi zor e
Porî min î sor e
Porî min î sor e
Keziya xelqe dor e
Şûştina xelkê çi zor e

Porê min spî ye
Porê min spî ye
Gulya bi sed û sî ye
Şûştina daykê hêdî ye
Porê min spî ye
Gulyê min spî ye
Keziya bi sed û sî ye
Şûştina daykê hêdî ye

Institut kurde de Paris

# Zengilê Narîn

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-11
Çavkanî: Emîna Elî
Herêm: Amed / Navçeya Bismil / Gundê Çawîşiyê
Berhevkar: Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 01.01.2015

Notadanêr: Evren Koç




Narîn narîn narîn narîn zengilo narîn
Narîn narîn narîn narîn genimê parîn

Hewşa ewkî me b'keviro zengilo narîn
Hewşa ewkî me b'keviro genimê parîn
Hewşa Fexrî me b'keviro zengilo narîn
Hewşa keko me b'keviro genimê parîn
Texsî dolmîş çireviro zengilo narîn
Texsî dolmîş çireviro genimê parîn
Hîlmî hatû w bûka xwu biro zengilo narîn
Keko hatû w bûka xwu biro genimê parîn
Hewşa Selîm peya kiro zengilo narîn
Hewşa keko peya kiro genimê parîn

Institut kurde de Paris

# Zer Hêlan

Bîra Muzîka Kurdî
No: G - AJD-12
Çavkanî: Emîna Elî
Herêm: Amed / Navçeya Bismil / Gundê Çawîşiyê
Berhevkar: Hîlmî Akyol
Dîroka Sererastkirinê: 01.01.2015

